Kêywan bira, çi wexta mirinê bû!??

Kakşar Oremar
kakshar_oremar@yahoo.de

Çi wexta xatirxastina yekcarî bû Kêywanê bira!? Hevalê rojên tengavî, xweşî û nexweşiyên min Kêwan can... bawer bike girî nahêle ez kulên dilê xwe yên vê xebera reş, binivîsim. 10 sale ku ez ji Kurdistanê dûrim, lê bawer bike min di van deh salan da xebereke wiha nexweş nebihîstibû. Belê belkî xeberên nexweştir jî hebûne, lê di baweriya min da nagûnce ku xebera mirina te ji nişkave wiha belav bibe. Mala biharê xerab bibe, di rojên xwe yên destpêkê da bû xezana dilê min.

Bira : hêşta tenê 34 bihar ji temenê te derbas bibûn. Di bihara omirê xwe ya 34an da tu pir bi liv û lebat bûy daku dûr ji ferq, cudatî, sansûr û zulma dagirkeran, karekî bikey ku hem evîna te ya veşartî di salên berê da û hem jî ala welatê te Kurdistanê di nava alên cîhanê da baş kifş û bilind bibe.
Ez dizanim şev û roja xewna te ew bû ku wekî qehremanekî werzişkar navê Kurd û Kurdistanê li cîhanê belav bikî. Te gelek cara behsa vê daxwaza xwe ya mezin ji min ra kiribû. Te çi cara xwe ji doza gel û welatê xwe dûr nexist. Mezintirîn hesreta te ew bû ku careke din rûmeta wendabûy ya bab û kalan bi nav û keda xwe zindî bikî. Ew keramet û rûmeta ku Pehlewî û Xûmêynî bi hemû şêweyan xwestin di nava malbateke mezin ya weke malbata we da nemîne. Bo vê armancê elbete Kêywanê bira, te xebateke baş kir û di nava navan da, « Kêywan Herkî » jî êdî meşhûr bibû.

Bi hêz û enirjiya di mil û destên te da dihat ku tu jî bibî xwedî navekî cihanî. Ji vê meremê ra xewnên te yên şirîn pir bûn. Xewnên ku nêzî rastiyê bibûn.... Lê heyf, hezar car mixabin çerxa felekê tim ne li gor daxwaza dilê merovan e Kêywanê şirîn. Felek bi tera jî wefadar nebû. Çi cara xweşî nedan te. Di bihara jiyana tejî hîvî û xweşî da gula jiyana te jî per-per bû hevalê min. Mala felekê xera be ku rehmê bi tukesî nake bira.

Kêywan can: Ji roja ku me li

Urmiyê hev naskir heya berî çend roja ku zêdetir ji du saeta em bihevra li ser gelek tişta axivîn, hertim di dengê te da hêzeke germ hebû. Lê îro xebera mirina te ya tirajîk weke ku dunya bi ser serê min da wêran kiribe, jiyan li ber çavên min reş kir!!. Min nexwest vê xebera reş bawer bikem, lê ez bawerim ku êdî bi dengê te peyvên:**“ Cergo, bira û Kurd û Kurdistan** »ê nabihîsim. .Tim û tim evîneke mezin û hezeke bêdawî di dengê te da dihat bihîstin. Gelo çima gula vê evîna mezin wiha zû çilmisî?!!

Xwezî û hesretên te wisa mezin bûn ku te ji bo cî bi cîkirina wan xwe li her dar û berekê da. Te sinor birrîn û berî salekê li xerîbiyê akincî bûy. Elbete sedem jî ew bû ku te li wê Îrana mezin nedikarî wan xweziyên xwe pêk bînî. Çavnebarî li ser te pir bûn û wan tehemûla pêşkeftina kesekî weke te nekirin.

Dema tu li ser daxwazên xwe diaxivî hezar hîvî di dengê te da hebûn.
Heyf, gelek mixabin ku guleke bêhnxweş wiha zû per-per bû. Gula ku dikarî di paşerojê da çîçkenên rengîn perwerde û teslîmî bostanê gulên Kurdistanê bike.

Bira Kêywan: çiqas li ser te binivîsim dîsa jî kême, ev êşa dilê min nakewîne. Lê tenê dibêjim : xweziya mirin nebûya bi para herkesî.

Ji sala 1996an ku me hev naskir, tu hertim hevalekî wefadar bûy. Hemû rojên ku em bihevre bûn, tejî xatre û bîranînên xweşin. Ez wan rojên bi tera qet ji bîr nakem.



Kurte Biogirafiya Kêywan Herkî:

Kêywan Cihangîrî kurê Mameş û Cemîle Cihangîrî di 19. 09. 1975an li bajarê Urmiyê hate dinê. Ew di nava gel da bi nasnavê xwe « Kêywan Herkî» jî dihate naskirin. Ew neviyê Kurdperwerên mezin nemir Emîrxan û Reşîdbegê Herkî bû ku di çaxê komara Kurdistanê da bi hêza eşîrtea xwe xwedî rolekî pozîtîv bûn. Ew li herêma Urmiyê wek malbat serkêş an jî mezinên eşîreta Herkî naskirî û navenda eşîreta wan gundê Mewana ye.

Kêywan di jiyana xwe da xortekî pir bi liv û lebat bû. Hertim dixwest mîna heloyekî bilindfir be. Sporkarekî pir hêja û zîrek bû.
Mixabin roja pêncşemê 19ê adara sala 2009an saet 11.30ê berê sibê li bajarê Wien (paytexta Avustriya) dema ku dixwest ji cadê derbasî aliyê din bibe, ket ber trena strbahnê û di cih da canê xwe ji dest da.
Kêywan xwedî jiyaneke tejî liv û lebat bû, daxwazên herî mezin di dilê wî da bûn, lê sedhezar heyf û mixabin deftera jiyana wî pir erzan hate dadan.

Detayên jiyana Kêywan Herkî:

Pileya xwîndina wî: Kulêca perwerda werzişî li zankoya Selahedîn Eyyubî li başûrê Kurdistanê bidawî anîbû.

Sala 1985an dema ku hê 10 salî bû dest bi fêrbûna spora karatê kir.

Sala 1990an karî bi mamostayê xwe Kawîs Xeyatzade ra geme an jî spora binavê “Şîtoriyo karatê” bîne wilayeta Urmiyê li rojhelatê Kurdistanê.

Sala 1993an bawirname an jî dîploma xwe ya hînkariyê di bin çavdêriya du mamostayên Japonî **Hîroşî Murata û Ginzo Îvata** li Îranê stand.

Sala 1993an di kêbirkiya navnetewî ya ciwanan da di beşa karatê da, li bajarê Tebrêzê li Îranê pileya duyemîn bidest xist.

Sala 1999an bû mamostayê fêrkirinê li Galatasaraya Istembolê li welatê Tirkiyê.

Sala 2000an para spora karatê ya bi navê **"Şîtriyo"** li Îraq û Hewlêrê damezirand.

Sala 2000an li zankoya Selahedîn dest bi xwîndina perwerda spor kir.

Mamostayê hînkirina sporên binavên: **Şîtriyo Şîtokay û Şîtoriyo Kobe Ozaka** bû.

Mamostayê derce 1ê cîhanî di beşa **"World Thai Kickboxing League"** da bû.

Xwediyê kemera reşa **"4dan"** di karatê da û kemera reş **"5dan"** di **"World Thai Kickboxing League"** da.

Sala 2005 heya 2006an: Serok û birêveberê sazûmana **"World Thai Kickboxing League"**li Îraq û Kurdistanê.

Sala 2008an serok û birêveberê sazûmana **ISKA** li Îraqê.

22. 03. 2008 Roj TV